

# Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê

Federasyona Xweser a Kurdistanê parçekekî dewleta Sûrî ê, wekî Paytextê Federasyona Rojava Qamislo ye. Navê herêmê jî wek "Rojavayê Kurdistanê". Nifûsa Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê 4,6 mîlyon e. Pişî şerê li Sûriyê li dijî Rejîma Baas Besar Esed, Şerê Navxweyî yê Sûriye û Iraqê dest pê kir. Bi ser de jî, Dewleta Islamî ya Iraq û Şamê hemû Kurdistan girt. Ji ber vê yekê, Hevbendiya Hêzên Xizmeta Yekgirtû - Tevgera Biryara Giştî Hêzên Sûriya Demokratîk di bin serokatiya Yekîneyên Parastina Gel û Yekîneyên Parastina Jinê, bi piştgiriya Yekgirtû ava kir. Yekemîn operasyona rizgarkirinê di 19'ê Tîrmeha 2013'an de pêk hat.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, di 21ê kanûna paşîn a 2014an de bi ragihandina hikimet û rêveberiya herêma Cizîrê re hat denezendin. Rêveberiya xweser li herêmên ku xwedî navend in hat beşkirin. Herês herêm rêveberiyê wan û hikimeta wan hat avakirin û ragihandin ku herêman bi rê ve bibin. Zimanê fermî ê herêmê rojava, Zimanê kurdî, Zimanê asûrî û erebî ya. Ala wê kesk û sor û zer a.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, berî ku were ragihandin demek dirêj amedekerî bo wê hatina kirin û temenê wê hat pêşxistin. Li herêma Rojavaya Kurdistanê saziyên civatî ên rêveberinê, perwerde û çandê û hwd, hatina ava kirin. Pişî rêveberî, desthilatdarî û hikimeta herêma başûrê kurdistanê, ev herêma rojavayê kurdistanê avakirina wê, bû duyemin herêm ku kurdan bîdestê xwe li wan rêveberiya xwe cewherî ava kirin. Di destpêkê de, dewletên herêmê ên weke tîrkiya komên tundrew bi rîexistin dikirin û didane hêrîşkirin li ser rêveberiya xweser a rojavayê kurdistanê. Hemû deriyênlî alikariyê li rojavayê kurdistanê hatina girtin. Bi tememî ambargoyaka jidahî li ser rojavayê kurdistanê hat danîn. Rêveberiya başûrê kurdistanê jî, tevî ku rêveberîyek kurd bû, ew jî tevîlî hêzên ku ambargo danîna er rojavayê kurdistanê û hemû deriyênlî ku ji başûrê kurdistanê diçûna rojavayê kurdistanê ên weke "deriyê sêlmalka", hatina girtin û ne hiştin ku ne mirov û ne alikarî di wan bi buhurê. Tenê ji mirovên ku ji rojava bâzidan û goç dikirin ew derî vekirin.

Pişî ku rêveberiya rojavayê kurdistanê û hikimeta wê hat avakirin, êdî hemû kurd ketina nava hewkariyê de ku wê pêş bixin. Ji bakûrê kurdistanê, rojhilat, û başûrê kurdistanê jî alikarî ji wê re dikirin. Lê li başûr, partiya kurd PDK, ku weke partiya ku di hilijartinan de bi serketibû û partiya mazin bû, wê alikarî neda rêveberiya xweser a rojavayê kurdistanê. Vê yekê jî, dilê hemû kurdan şikand. Kurd xamgin kirin. Kurdan, ew helwesta partiya kurd a PDK, li dijî rabûn û gotin ku "ev ne li gorî nirx û kevneşopiya me ya" û şermazar kirin.

rêveberiya xweser a rojavayê kurdistanê, dema ku konfaranse CENEV 'ê li Cenevê dihat li darxistin de hat ragihandin. Gelek dordoran jî şîrovekirin û gotin ku "ji ber ku kurd ne hatina dewetkirin li konfaranse û ji ber ku ne dixwestin li lozanek din a duyemin were serê wan, rêveberiya xwe ragihandin. Rêveberiya kurd, li rojavayê kurdistanê pişî hat ragihandin, bi alikariya tîrkiya û welatên din ên

## Federaliya Demokratîk a Bakûrê Sûriyê

الفدرالية الديمقراطية لشمال سوريا  
فەرەلیا دەمۆکراتیکا بەشمال سۇریا




Ala



Mertal

**Dirûşm:** An Azadî, an azadî



### Rewş

Federasyona *de facto* ya Sûriyê

### Paytext

Reqa

37°03'BK 41°13'RH

### Bajarê mezin

Hesekê

### Zimanê fermî

Kurdî Erebî

### Ziman naskirin

Kurmancî

### Zimanê fermî

Kurdî • Tirkî • Erebî • Asûrî

### Komên etnîkî

Kurd • Ereb • Asûrî • Tirkmen • Çerkez • Keldanî • cihûyî • Merdlefî • Ermen

### Demonîm

Kurd

### Rêveberî

Demokrasiya rasterast (Konfederalîzma demokratîk)<sup>[1][2][3][4][5][6]</sup>

- Hevserok

Hediya Yûsif<sup>[7]</sup>

- Hevserok

Mensûr Selûm<sup>[7]</sup>

### Pêşvebirî

Encumena Nişimanî

- Meclîsa jorîn

Desteya Bilind

### Avakirin


- Pêşniyarkirin
- Îlankirin

Tîrmeh 2013

Çiriya paşîn 2013

herêmê komên tundrew bi rêxistin kirin û dan hêrîskirin li ser wê rêveberiya xweser a rojavayê kurdistan. Ji ber ku welatên herêmê li dijî pêşketina statûya kurdan bû, ev hêrîş li wê rêveberiya kurd dan kirin.

## Rûerd



çarçova wê berfireh dibe.

Mirov dikare avhewaya Rojavaya Kurdistanê bike du beş. Beşa yekem avhewaya herêma Efrînê ye. Avhewaya li vê derê nezîkî ya Deryaya Spî ye. Havînan germ e û carnan baran dibare; zivistanan jî zêde ne sar e. Ji ber vê avhewayê herêma Efrînê, şîn e, dar û ber lê zêde ne. Her cureyên daran hene [çavkanî hewce ye]. Lê piranî darêne zeytûnan e.

Beşa duyem ku Serê Kaniyê, Hesiçe, Amûdê, Qamişlo û Dêrik hildide nava xwe bi berrî û deşt e. Çiya û daristan nîn in. Zivistan kin in. Hema hema berf nabare. Carinan baran dibare. Di meha Çileyê de li Qamişlokê germahî digihîje +7, li Dêrik û Amûde jî +6 pîleyan. Havîn dirêj in. Germahî piir e. Ziwayî heye. Havînan ji çolêne Erebistan û Sûriyê bayên germ têne û bandor li avhewaya herêmê dikin. Havînan germahî digihîje 40 pîleyî.


Rojava ji Çiyayê Gewr dest pê dike û heta herêma Efrînê û Çiyayê Kurmênc tê. Çiyayê Kurmênc 1200 m bilind e. Ji çiyayê Kurmanc heta Kobanî, axa Kurdistanê teng e û ereb li vê deverê dijîn. Li herêma bajarê Kobaniyê axa Kurdistanê dîsa fireh dibe û kurd li ser axa xwe dijîn.

Qamişlo û Nisêbîn yek bajar in, lê di navbera Tirkiyeyê û Sûrî de hatine dabeşkirin. Qamişlo di desthilatdariya Sûriyê û Nisêbîn jî di bin destê Tirkiyeyê de maye. Hûn di wêneyê de li Nisêbînê ala tîrkan û li Qamişloyê jî ala Sûriyê dibînin.

## Kantonên Rojavaya Kurdistanê

- 🔍 Gotara bingehîn: [Kantona Cizîrê](#)
- 🔍 Gotara bingehîn: [Kantona Efrînê](#)
- 🔍 Gotara bingehîn: [Kantona Kobaniyê](#)
- 🔍 Gotara bingehîn: [Herêma Şehbayê](#)

Di 21ê kanûna paşîn a 2014an de Rêveberiya xweser a rojavaya Kurdistanê hat demezrandin. Rêveberiya xweseriya rojavaya kurd weke sê kantonan hat ragihandin. Kantona pêşî ya ku di 21ê kanûna paşîn de rêveberiya wê ya xweser hat ragihandin, Rêveberiya xweser a kantona Cizîrê bû. Kantona duyem ku di 27ê kanûna paşîn a 2014an de rêveberiya wê ya xweser hat ragihandin, Rêveberiya xweser a kantona Kobaniyê bû. Kantona sêyem jî, ku rê veberiya wê di 29ê kanûna paşîn a 2014an de hat ragihandin, Rêveberiya xweser a kantona Efrînê bû.



Kantonên Rojavaya Kurdistanê, 2014

- Avakirin Çiriya paşîn 2013
- Makezagon Kanûna paşîn 2014
- Federasyon 17ê adara 2016

### Gelhe

- 2014 Texmînkirin 4,6 milyon (nîvê wan penaberên navxweyîne) [8][9][10]

**Endamtí** 100 → 200 Hezar

**Dirav** Diravê Sûriyê (SYP)

**Demjimêr** EET (UTC+2)

**Celebê dîrokê** rr/mm/ssss

**Hatûçûna ajotinê** rast

**Koda telefonê** +963

**Internet TLD** .krd

Her kanton jî, rêveberî û hikimeta xwe ya demkî ragihandin. Pişû ku ragihandina Rêveberiya xweser a rojavayê Kurdistanê jî, êdî di nava kurdan de bi rojan bû sedema şahiyan [çavkanî hewce ye].

## Rêveberiya Federasyonê

### Rêvebirên Kanton

Kantona Rojava		Navê fermî (ziman)	Serokwezîr	Cigirê Serokwezîrê	Hevpeymaniya Rêvebirê	Hilbijartinê paşve	Hilbijartinê pêşve
		Kantona Efrînê	Kantona Efrînê (kurdi) مقاطعة عفرين (erebî) واحدة عفرين (asûrî)	Hêvî İbrahîm	Remzi Şêxmus Ebdil Hemid Mistefa	TEV-DEM	Kanûna paşîn 2014
		Kantona Cizîrê	Kantona Cizîrê (kurdi) مقاطعة الحزيره (erebî) واحدة الحزيره (asûrî)	Akram Hesso	Elizabeth Gawrie Hussein Taza Al Azam	TEV-DEM	Kanûna paşîn 2014
		Kantona Kobaniyê	Kantona Kobaniyê (kurdi) مقاطعة كوباني (erebî) واحدة كوباني (asûrî)	Enwer Muslim	Bêrîvan Hesen Xalid Birgil	TEV-DEM	Kanûna paşîn 2014
		Herêma Şehbayê	Herêma Şehbayê (kurdi) مناطق الشهباء (erebî) واحدة الشهباء (asûrî)	Ismail Musa	Mohammed Ahmed Khaddro Ayman al-Hafez	TWDS	Sibat 2016
		Konfederasyon	الفدرالية الديمقراطية لشمال سوريا (erebî) Federaliya Demokratik a Bakûrê Sûriyê (kurdi) الاتحاد الديمقراطي لشمال سوريا (asûrî)	Hediya Yûsif Mensûr Selûm	N/A	'TEV-DEM	Adar 2016

### Encûmena Federal


Nav	Partî	Hevkârî	Kanton
Îşûh Gewriyê	Partiya Yekîtiya Suryanî (SUP)	TEV-DEM	Cizîrê
Meram Dawûd	Peymana Rûmet û Mafan		?
İbrahîm El-Hesen	N/A	N/A	Kobanî
Rojîn Remo	Yekîtiya Star	TEV-DEM	N/A
Hikmet Hebîb	Koalîsyona Neteweyî ya Ereb		?
Bêrîvan Ehmed	N/A	N/A	N/A

Cemal Şêx Baqî	Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûriyê (PDKS)	KNC	?
Parêzer Elaaddin El-Xalid	Hevbendiya Demokrat a Niştimanî ya Sûrî		Şehba
Salih El-Nebwanî	Tevgera Mafêن Zagona Hemwelatiyê (QMH)		?

## Dîrok

### 🔍 Gotara bingehîn: Dîroka Rojavaya Kurdistanê

Dîroka Rojavaya Kurdistanê, pirr kevn diçe. Bi taybetû, li ser wê axa wê, ji demên Sumeriyan ve li wir jiyane û şaristanî di pêşketinê de ya. Ev herêm Rojavaya Kurdistanê, dikeve keviya çemê mezin û navdar ê Firatê de. Di demên berê de, heta ku digihişt ber çiyayê kurdan û bajarêne weke Efrîn, Kobanî, Serêkaniyê çem diherikî. Ev herêm, weke herêmên şîn û pêşkeû bûn. jiyanê li van herêman, di pirtûkên pîroz de jî bicih bûye. Bi taybetû, ji ber Kobanî û Efrînê û heta ku digihije Helebê û piştre Şamê, weke herêmên ku li wan zanebûn pêş diket bû. Birehîm Xelîf, çanda wî li vê herêmê bicih bûye. Mîtra, di dema mîtaniyan de hatiye û ew bixwe jî ji Mîtaniyan bûye. Mîtanî jî kurd bûne.<sup>[11]</sup>




Rojavaya Kurdistanê, 2014

Li herêmê, pişti ku rejima be'sê lê tê û serdest dibe, navê herêmê giştikan diguherîne. Lê navêne herêmê kevn in. Mînak, navê Kobanê<sup>[12]</sup>, ji dema Hûriyan a. Navê Serêkaniyê bi rengê 'weşokanî' ji dema hûrî û mîtaniyan e û di dema Mîtaniyan de bûye paytext ji mîtaniyan re. Herêma Serêkaniyê, pişti ku dewletên Sûrî û Tirkiyeyê ava bûn, bû du-qism. Qismekê li Sûrî ma û rejima Be'sê navê wê guharand û kir "Rasûlayn". Qismê wê yê li aliyê Tirkiyeyê ma jî, rejima tirk navê wê guharand û navê wê kir "Ceylanpinar". Lê ev herdu qism jî, berê yek bûn û bajarek bûn. Berê di ber re jî û di navê de jî şaqna ji çemê Firatê diherikî.



Rojavaya Kurdistanê, 2015

Di demên berî zayinê de, di dema Gûtiyan de jî, di nava sînorê Gûtiyan de bûye. Pişti gûtiyan re ku hûrî û mîtanî hatin, êdî ew herêm bû weke navend û paytexta wan ku ew lê bi pêş ketin û mezin bûn. Li herêmê, di dema Sumeriyan de, di dema Xanadana Ur de jî, ev herêm ji wê re û jî pêşketina wê re bûye hîm. Ji her se xanedanê Uran re jî wisa bûye. Îro, di roja me de ku dikeve naqabîna Efrîn û Helebê de, di dema Sumeriyan de ku ji wê re 'Marî' dihat gotin, nivîsa bizmarî ku li wir hat dîtin, û tercumeyên wê bi navê "hurrian and hurrian names in the mari tekst" de navê "Kobanê" û hwd hene. Marî, di dema hûrî û mîtaniyan de di nava sînorê hûrî û mîtaniyan de bû.



Rojavaya Kurdistanê, 2016

Di dema hûrî û mîtaniyan de, bi pêşketina xwe di aramiyê de li vê herêmê jiyane. Lê piştre, di dema Asûriyan de, rastî êrîşan hatiye. Di dema Îskenderê Mezin de jî rastî êrîşan hatiye. Gava ku Medî li herêmê bûn desthilatdar ew der di nava sînorê xwe de girt û bi wê re li ser herêmê Anatolia jî karî ku serdestiya xwe bide erêkirin. Di pirtûkên pîroz de behsa Nemrûd tê kirin ku di dema Birehîm Xelîf de jiyaye. Nemrûd jî, di dema xwe de li vê herêmê xwe kiriye hukimdar. Çanda herêmê, heta dema derketina İsləmiyetê li gor çanda Îzidîtiyê bû. Piştre dînê İslâmê ew der jî kiriye bin destê xwe de û guherandiye. Piştre, demên desthilatdariyên kurd ên dewletên kurd Merwaniyan û Eyûbiyan li herêmê bi pêş dikevin. Herêm, di dema Eyûbiyan de, ji sadsala 11em hetâ sadsala 16em, di bin destê desthilatdariya xanadana eyûbiyan de dimîne.<sup>[13]</sup> Pişti ku Osmanî bi pêş ketin, êdî osmaniyan, ew der weke eyeletekê desthilatdariya eşîrên kurd qebûl kiriye.

## Ziman

Zimanê ku zêde tê axaftin zimanê kurdî zaravayê kurmancî ye. Lê zimanê erebî, asûrî û hwd jî li herêmê dihêne axaftin. Li herêmê rojnameyên bi kurdî, TVyên bi kurdî jî hene. Ronahî TV, TVya kurdî ya Rojavayê Kurdistanê ye. Ji aliyê çapameniyê ve, pişti ku şoreşa Rojavayê kurdî bû, hêdî hêdî qada çapameniyê jî berfireh dibe.

## Dîn


Olên ku li herêmê dijîn, weke olên sereke İslamiyet, Îzîdîtiyê û Xiristianî ye. Lê mezhebên van olan, ku mirovên ji wan jî hene. Ji sedî 80yê wê derê misilman in. Hejmareke mezin ya êzîdiyan jî li herêmê heye û ev jî li gorî ku tê gumankirin ser sedî 10an re ye. Lê gelekan jî, ji herêmê xwe koşber kirine. Berê, ev hejmar pir zêde bû. Her wisa, xiristianen li herêmê di derûdorê ji

sedî 10an de ne. Asûrî, piraniyan, ji dînê Xiristiyânî ne. Lê ku ne pir zêde jî bin, Kurdên Mesihî jî hene. Herwisa, Kurdên cihû jî berê li wir dijiyan. Heta dema rejima Be'sê li wir dijiyan, pişre, hinekan ji wan koçî Îsraîlê kirin û hinekan jî koçî welatêne wropî kirine. Îro, her wisa zêde cihû li herêmê nemane. Lê li çend cihan, hê jî kinîştên wan hene ji bo bergkirinê.


## Bajar

Bajarên herêmê:

- Amûdê
- Cerablus [Kaniya Dil]
- Cindirêşê
- Dêrika Hemko
- Dirbêsiyê
- Efrîn
- Êndîwer
- Ezaz (en)
- Girê Spî
- Hesîçe
- Kobanî
- Bozanê (Eyn îsa)
- Silûk
- Minbic [Mabuk]
- Qamişlo
- Serêkaniyê
- Tirbespiyê
- Til Koçer
- Şedadî
- Hol
- Babê
- Sirîn
- Reqa
- Tebqa
- Baxoz
- Hicîn
- Elbû kemal
- Dêrezor
- Risafê
- Zirgan



Bajarên Rojavaya Kurdistanê



Bajarên Rojavaya Kurdistanê

Li Rojava Hesîçe, Reqa, Dêrezor, Heleb wîlayet in, yên din qeza û nehiye ne. Qamişlo qezaya Hesîçeyê ye, Qamişlo wekî navend û paytextê Kurdên Rojavayê Kurdistanê tê pejirandin. Li navenda Qamişlo nêzî 150.000 kes dijîn [çavkanî hewce ye]. Li bajarên Sûriyê, li Heleb, Hims, Şamê, Hema, Dera, Laziqiye û Tertûs jî gelek taxên kurdan hene [çavkanî hewce ye].

Di nava bajarên Rojavaya Kurdistanê ji aliyê erdnîgarî ve Serêkaniyê, Efrîn, Kobanî, Qamişlo, Hesekê, Reqa, Dêrezor, Heleb, Minbic, Ezaz, Babê û Kaniya Dil ji bajarên mezin in. Bajarê Serêkaniyê, weke bajarekî pirr mezin a. Lê ji ber ku di nava sînorê Tirkîye û Sûrî de hatîye qatkîrin û qatek li aliyê Tirkîyeyê ango Bakûrê Kurdistanê û qatek li aliyê Sûrî û ango Rojavayê Kurdistanê maye, êdî biçûk bûye. Lê ji aliyê erdnîgarî ve weke bajarê mezin ê dîrokî ye. Di dema Mîtaniyan de, Serêkaniyê bi navê 'weşokanî' herdu bi hevdu ve bûn û paytext bû. Weke bajarê mazin ê lê jiyan û şaristanî pêşketî bû. Di nava bajarê de, berî avakirina komara tirk û ya Sûrî, xeta trenê derbas dibû. Ew xeta trenê, piştre kirine weke sînor. Aliyê xeta trenê ê li aliyê Sûrî û ango li aliyê Rojavayê Kurdistanê li wî alî maye û aliyê li vî xeta trenê jî di nava sînorê Tirkîyeyê ango li Bakûrê Kurdistanê maye.

Bajarêن Rojavayê Kurdistanê, ên weke Amûdê, Efrînê, Qamişlo, Serêkaniyê, Hesekê, Tirpesipiyê, Girê Sipî, Tilkoçer û hwd, çend ji wan bajarêن mezin in ku nifûsên wan pir in. Tilkoçer, dikeve sînorê Îraqê de. Deriyê li Îraqê, yek jê ji Tilkoçerê vedibe.

## Desthilatdarî

Desthilatdarî, iro di destê kurdan de ye. Kurd, rêveberiya xwe ya xweser a Rojavayê Kurdistanê ragihandin. Herêma Rojavayê Kurdistanê, li sê kantonan hatiye beşkirin û rêveberî û hikûmetên wan ava kirin. Ev hersê kanton jî, "Kantona Cizîrê", "Kantona Kobaniyê" û "Kantona Efrînê" ye. Îro, Rojavayê Kurdistanê, ji aliyê van hersê rêveberiyêن xweser ên kurdistanî ve tê birêvebirin. Herêm, bajarê wê ê mezin Qamişlo ye. Qamişlo, weke paytexta herêmê jî tê dîtin.

Hikûmeta hersê kantonan, ji 22 wezaretan pêk tê. Ew wezeret, xwe li herêmê bi rôexistin dîkin û herêmê bi rô ve dibin. Kurd, pişti ku bi xelkên din ên li herêmê re şoreşa rojava kirin, êdî ew rêveberî jî hatine avakirin û ragihandin. Lê rêveberiyên herêmê, ji aliyê welatên herêmê ên weke Tirkîye û Îranê ve hatiye xistin bin ambargoyê de. Pişti ku rêveberiya xweser hat ragihandin, ew êdî care pêşî bû ku rêveberiyekê ji xelkê li herêmê hatibû avakirin.

Pişti ku kurdên Rojavayê Kurdistanê, bi xelkên din ên li herêmê re ku rêveberiya Rojavayê Kurdistanê ava kirin û ragihandin, êdî dest bi dîplomasiya nasandina wê kirin. Gelek heyet ava kirin û şandine welatên Ewropî û welatên din ên cihanî ku xwe bidin nasîn.

## Hêzên parastinê ên Rojavaya Kurdistanê

- Gotara bingehîn: [YPG](#)
- Gotara bingehîn: [YPJ](#)
- Gotara bingehîn: [QSD](#)
- Gotara bingehîn: [Asayîş](#)

Pişti ku kurdan li herêmên xwe rêveberiya xwe ya xweser ava kirin û ragihandin, êdî hêzeka xwe ya parastinê ku ji kurdên Rojavayê Kurdistanê û beşen din ên civatî afîfî ava kirin. Ew jî, navê YPG, Gerîla, Pêşmerge direjîhiya wê "Hêzên Parastina Gel" e. Herêmên kurdan diparêze. Lê bi wê re jî, YPJ hat avakirin. Ev jî, weke hêz û artêşa jinan e. Pirraniya endemên YPJê ji jinêni ciwan ên kurd û komên din ên li herêmê ku dijîn pêk tê. Wekî din jî, hêza Aşayîşê heye. kar û erka Hêza Asayîşê ew e ku aramiya nava bajaran biparêzê. Weke hêza polîsan e.

Kar û erka Hêzên Parastina Gel ku bi navê wê yê kurt [YPGê](#), ew e ku weke artêşa Rojavayê Kurdistanê li dijî êrîşen ku ji derve têbi ser Rojavayê Kurdistanê bergirî bike. Herwisa bi vî rengê YPGê, em dikarin weke artêşa Rojavayê Kurdistanê jî bi nav bikin. YPGê, temamiya Rojavayê Kurdistanê diparêzê. Her kesekê li herêmê diparêze kurd be an ne kurd be. Aramiya wan temîn dike. Herwisa, weke artêşa Rojavayê Kurdistanê, ji aramî û parastina Rojavayê Kurdistanê ew berpirsiyar e. YPGê, ne hêzek siyesî ye. YPGê, hêzek leşkerî ya parastinê ye. Artêşa Rojavayê Kurdistanê ye.

## Partiyên kurdî

- [Desteya Bilind a Kurd](#)
- [Partiya Yekîtiya Kurdî li Sûriyê](#)
- [Partiya Yekîtiya Demokrat](#)
- [Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûriyê](#)
- [Yekîneyên Parastina Gel](#)
- [Partîya Democrat a kurdî ya sûrî](#)

## Mijarên têkildar

- [Serhildana Rojavaya Kurdistanê](#)
- [Şerê navxweyî yê Sûriyê](#)
- [Rêveberiya xweser a rojavayê Kurdistanê](#)
- [Dîroka Rojavayê Kurdistanê](#)

## Çavkanî

1. Enzinna, Wes (24 çiriya paşîn 2015). ["A Dream of Secular Utopia in ISIS' Backyard"](#). *The New York Times*. Roja wergirtinê: 13 gulan 2016.

2. Jongerden, Joost. "Rethinking Politics and Democracy in the Middle East" (PDF). Ji orijinalê (PDF) di 15 adar 2016 de hat arşîvkirin. Roja wergirtinê: 8 ûlon 2013.
3. Ocalan, Abdullah (2011). *Democratic Confederalism* (PDF). ISBN 978-0-9567514-2-3. Roja wergirtinê: 8 ûlon 2013.
4. Ocalan, Abdullah (2 nisan 2005). "The declaration of Democratic Confederalism". *KurdishMedia.com*. Ji orijinalê di 23 kanûna pêşîn 2013 de hat arşîvkirin. Roja wergirtinê: 8 ûlon 2013.
5. "Bookchin devrimci mücadelede yaşayacaktır". *Savaş Karşıtları* (bi Turkish). 26 tebax 2006. Ji orijinalê di 2 kanûna pêşîn 2013 de hat arşîvkirin. Roja wergirtinê: 8 ûlon 2013.
6. Wood, Graeme (26 çiriya pêşîn 2007). "Among the Kurds". *The Atlantic*. Roja wergirtinê: 8 ûlon 2013.
7. "Kurdên Sûriyê ûlana federasyona nû li dozkirina ji bo naskirinê kir". *Middle East Eye*. 17 gulan 2016. Ji orijinalê di 16 tebax 2018 de hat arşîvkirin. Roja wergirtinê: 28 tîrmeh 2016.
8. In der Maur, Renée; Staal, Jonas (2015). "Introduction". *Stateless Democracy* (PDF). Utrecht: BAK. r. 19. ISBN 978-90-77288-22-1. Ji orijinalê (PDF) di 25 çiriya pêşîn 2016 de hat arşîvkirin. Roja wergirtinê: 28 tîrmeh 2016.
9. Estimate as of mid November 2014, including numerous refugees. "Rojava's population has nearly doubled to about 4.6 million. The newcomers are Sunni and Shia Syrian Arabs who have fled from violence taking place in southern parts of Syria. There are also Syrian Christians members of the Assyrian Church of the East, Chaldean Catholic Church, Syriac Catholic Church, Syriac Orthodox Church, and others, driven out by Islamist forces. "In Iraq and Syria, it's too little, too late". Ottawa Citizen. 14 çiriya paşîn 2014.
10. "A Dream of Secular Utopia in ISIS' Backyard". New York Times. 24 çiriya paşîn 2015.
11. Abdusamet Yigit, *Pirtûka, jiyane di bin roja Mîtra de dimeşê*
12. by Jack M. Sasson - Chapel Hill, North Carolina, HURRIANS AND HURRIAN NAMES IN THE MARI TEXTS
13. Abdusamet Yigit, *Pirtûka, 'di sedsale 21'ê de şoreşa kurd: rojava'*

## Girêdanê derive

Li Wikimedia Commons medyayê di warê *Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilate Sûriyeyê* ([https://commons.wikimedia.org/wiki/Category:Syrian\\_Kurdistan?uselang=ku-latn](https://commons.wikimedia.org/wiki/Category:Syrian_Kurdistan?uselang=ku-latn)) de hene.

## Weblink

- PYD Rojava (<http://ku.pydrojava.com/>) Girêdana arşîvê (<https://web.archive.org/web/20161124180601/http://ku.pydrojava.com/>) 2016-11-24 li ser [Wayback Machine](#)

Ji "[https://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=Rêveberiya\\_Xweser\\_a\\_Bakur\\_û\\_Rojhilatê\\_Sûriyeyê&oldid=1188252](https://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=Rêveberiya_Xweser_a_Bakur_û_Rojhilatê_Sûriyeyê&oldid=1188252)" hatiye standin.

■